

Agahdariyên derbarê COVID-19 (28.08.2020)



1. EZ DIKARIM ÇI BIKIM, HEGER NÎŞANÊN COVID19 LI BA MIN HEBIN?

Heger nîşanên nexweşiyê li ba te peyda bûn, ji kerema xwe pêşî telefûna textorê/a xwe yê/ya malê bike, taku ew binirxîne, ka gûmana pêketina bi nexweşiya Covid-19 li ba te heye, yan na. Tu dikarî her wiha ji bilî vê yekê telefûna xizmetgûzariyên amadebaşiya textoran di bin hijmara 116 117 bikî.

Hun dikarin listeya navên hemî textorên, ku têsta Korona li herêma we çêdikin, li vê derê peyda bikin:

Kombenda sendîkeya textoran li herêma Baden-Württemberg:

[https://www.kvbawue.de/buerger/notfallpraxen/corona-anlaufstellen/corona-karte/?tx_praxenmap_pi1\[action\]=csplist&tx_praxenmap_pi1\[controller\]=Praxis&cHash=8c8f8683d22b8d06983b0bdf0c165365#map](https://www.kvbawue.de/buerger/notfallpraxen/corona-anlaufstellen/corona-karte/?tx_praxenmap_pi1[action]=csplist&tx_praxenmap_pi1[controller]=Praxis&cHash=8c8f8683d22b8d06983b0bdf0c165365#map)

2. AGAHDARÎ JI BO MISAFIRÊN/MÊVANÊN JI WELATÊN DERVEY EUROPA TÊN

Endamên malbata piçûk (anku hevjin, hevjinên hemzayend û zarokên di bin temenê hijdeh saliyê re yan dayik û bavên zarokên, ku di bin temenê hijdeh saliyê re ne) yên ku hemwelatiyên welatên dervey Europa ne, û dibine mirovên hemwelatiyekî/hemwelatiyeke elman, yan mirovên hemwelatiyekî/e Yekîtiya Europa, Îslanda, Liştîştayn, Nerwîc, Swîsra yan Brîtaniya yan yên hemwelatiyên welatekî dervey Europa, ku mafê wan yê niştecibûnê li Elmaniya heye, dikarin ji bo serdanên malbatî yên ji bo demeke kurt, derbasî nava Elmaniya bibin. Û ew hemwelatiyên welatekî dervey Europa, ku endamên malbatê ne, dikarin bi tena serê xwe yan jî bi hevjinê/zarokên xwe re derbasî nava Elmaniya bibin.

Hatina bo Elmaniya bo demeke kurt ya hemwelatiyên welatekî dervey Europa ji bo mirovên xwe yên derece 1 û 2 tenê hingî mumkin e, heger sedemên malbatî yên gelekî giring hebin.

Endamên malbatê yên derece 1 û 2, wek mînak zarokên temenê wan tijî bûyî, dayik û bavên zarokên, ku temenê wan tijî bûye, xwişik û bira û dapîr û bapîr), ku hemwelatiyên welatekî dervey Europa ne û dibine mirovên hemwelatiyekî/hemwelatiyeke elman, yan mirovên hemwelatiyekî/e Yekîtiya

Europa, Îslanda, Liştinştayn, Nerwîc, Swîsra yan Brîtaniya û hemwelatîyên welatekî dervey Europa, ku mafê wan yê niştecibûn li Elmaniya heye, bi giştî **nikarin** bi tenê ji bo serdanên malbatî yên ji bo demeke kurt, derbasî nava Elmaniya bibin.

Endamên malbatê yên dûr, ku hemwelatîyên welatekî dervey Europa ne, û ne mirovên derece 1 û 2 ne, bi giştî nikarin bi tenê ji bo sedemên malbatî derbasî nava Elmaniya bibin.

3. AGAHDARÎ JI BO KESÊN VEDIGERIN NAVA WELAT

KESÊN KU JI HERÊMÊN METIRSÎDAR TÊN, **MECBÛRIN XWE TÊST BIKIN.** HETA KU ENCAMA NÊGATÎV YA TÊSTÊ DERNEKEVE, EW KESÊN JI HERÊMÊN METIRSÎDAR HATINE, DIVÊ 14 ROJAN DI KARANTÊNA DE BIMÎNIN. Her kesekî, ku ji herêmeke metirsîdar derbasî nava Elmaniya bibe, divê ji bilî vê yekê jî hîn berî derbasbûna xwe karta peyabûnê (Aussteigekarte) tije bike.

Heger tu ji herêmeke metirsîdar derbasî nava Mannheimê bibî, **divê** tu yekser şehirdariya Mannheimê li ser vê yekê agahdar bikî! Ji kerema xwe yekser piştî vegera xwe E-mailekê ji vê navnîşanê re bişîne:

31corona@mannheim.de

[Divê tu di wê Ê-Mailê de navên **hemî** kesên malbata xwe/ku di mala te de dijîn, binivîsî: navên wan, dema jidayikbûna wan, dema hatina wan û heger bizanibî jimareya geştê ezmanî (Flugnummer), tu ji kîjan Welatî/Welatan vegeriyayî û ka tu 14 rojên berî ku tu vegerî li ku derê bûyî.

Pêwîstiya şehirdariya Mannheimê bi navnîşana Ê-Mail û navnîşana mala te heye (ka tu dê li dema karantêna xwe li ku derê bî) û heger mumkin be jimareke telefûnê jî binivîse, taku mirov karibe zû têkiliyê bi te re deyne.]

4. LI KU DERÊ Û ÇAWA TÊST ÇÊ DIBE ?

Qanûn dibêje, ku divê ew kesên ku ji herêmên metirsîdar hatine, li dema ku bigihîjin nava Elmaniya, divê ew yekser têsta Korona ji xwe re çêkin. Mirov dikare ji şûna vê têtê, encama nêgatîv ya têtê Koronayê bide dayra dewletê, lê divê ew encama têtê ne ji 48 saetan kevintir be.

Hun dikarin herêmên metirsîdar yên nû li ser vê malprê bibînin:

https://www.rki.de/DE/Content/InfAZ/N/Neuartiges_Coronavirus/Risikogebiete.html

Divê ew têtst li welatekî endam di Yekîtiya Europa de hatibe çêkirin yan di taqîgeheke din de, ku navê wê li ser malpera enstîtûta Robert-Koch hatibe

nivîsandin: www.rki.de/covid-19-tests. Divê ew raporta têtê yan bi zimanê almanî yan bi zimanê inglîzî hatibe nivîsandin. Hun dikarin hemî naveroka qanûna derbarê pêdiviya çêkirina têtê ji bo kesên ji herêmên metirsîdar hatine, li ser vê malperê bixwînin:

https://www.bundesgesundheitsministerium.de/fileadmin/Dateien/3_Download/s/C/Coronavirus/Testpflicht_Risikogebiete_VO_BAnz_AT_070820.pdf

**HALÊ HAZIR JI MISAFIRÊN JI HERÊMÊN METIRSÎDAR HATINE,
TÊSTÊN BÊ PARE TÊNE ÇÊKIRIN:**

- Navendên têtê ji bo têtên bê pare li hemî firokxaneyan hene.
- Navendên têtê li hindêk rawestgehên tirênan hene (wek mînak Stuttgart)
- Navendên têtê li cihên veysandinê yê curbecur li ser rêyên xurt yê terembêlan, piştî derbaskirina qapiyên sînorî, hene.
- Standina civanan li ba textoran di rêya kombenda sendîkeya textoran re: Tel: 116117 (bêy kod) yan çêkirina têtan li herêma xwe:
[https://www.kvbawue.de/buerger/notfallpraxen/corona-anlaufstellen/corona-karte/?tx_praxenmap_pi1\[action\]=csplist&tx_praxenmap_pi1\[controller\]=Praxis&Hash=8c8f8683d22b8d06983b0bdf0c165365#map](https://www.kvbawue.de/buerger/notfallpraxen/corona-anlaufstellen/corona-karte/?tx_praxenmap_pi1[action]=csplist&tx_praxenmap_pi1[controller]=Praxis&Hash=8c8f8683d22b8d06983b0bdf0c165365#map)
- Ji bo misafiran (ne hemwelatîyên elman yan kesên, ku mala wan li Elmaniya ye), ku têne nava Elmaniya, garantî TUNE YE, ku têsta bê pare ji wan re werin çêkirin. (Divê mirov hêdfî mesrefa wê têtê ji ba xwe bide)
- Navenda têtê li nexweşxaneya Mannheimê bi tenê têtê ji wan kesan re çê dike, yê ku nîşanên nexweşiyê li ba wan hebin.

Lê heger te têtêk çêkiribe yan na, divê tu bi her hal dema ku tu dîsa ji herêmeke metirsîdar vegeyayî, tu têkiliyê bi desthilatên herêmî re deynî 31corona@mannheim.de û wan li ser hatina xwe agahdar bikî!

Hun dikarin agahdariyên herî nû bi zimanên curbecur li ser malpera şehirdariya Mannheimê bixwînin

<https://www.mannheim.de/de/informationen-zu-corona/informationen-in-verschiedenen-sprachen>

Hay ji xwe û kesên din hebe, û tendirust bimîne!